

## Mîrê êzidiyan daxwaza penaberiye ji Elmaniyayê kir

Mecîd Heso & Lalis.de



Çavkaniyek bawerpêkirî da zanîn ku ji ber newekheviya siyasî û komelayetiya li herêma Kurdistanê divabera zorîne û hindikayiyên xelkê Kurdistanê de heyî, Mîrê êzidiyan Mîr Tehsîn Seid Beg daxwaza mafê penaberiye ji hikûmeta Elman kiriye, heman çavkanî piştrast kir ku li roja pêncşem rêkeftî 22.10.2009, mîr Tehsîn bi alikariya wergerekî kurd ku bi eslê xwe ji êzidiyên bakûrê kurdistanê ye li navenda rojavayê herêma Dortmonda Elmanî bi fermî serlêdana bidestve anîna mafê penaberiya siyasî pêşkêşî rayedarên Elman kiriye, ev nûçeye ji

hêla penaberên Kurd yê heman kempê ve hat piştrast kirin.

Ev çend roje di rojeva êzidiyên Europa de spekulasyon li ser eger û encamên penaberiya mîr Tehsîn tên kirin.

Ji hêlek din ve li roja 26.10.2009 Mîr Tehsîn beg ji ciyê mana xwe ya li bajarê Hanover da zanîn ku wî di nameyek nivîsî de ji serokkomar û serokwezîrê Iraqê xwestiye ku wekhevî û biratiya di navbera gişt pêkhatiyên wî welatî de bi parêzin.

Duh mîrê êzidiyan ji malpera bahzani.net re dabû xuyakirin, Êzidi li gorey nifûsa xwe di helbijartinên perlemana Îraqê de, ku çaverê ye li 16.01.2010 bên li darxistin, wek mafekî bingehîn di kotayek destnîşnîkirî de daxwaza pênc kursiyan dîkin, mîr Tehsîn dixwaze ku ev yek bi aşkirayî di reşnivîsa qanûna helbijartinên Iraqê de bê destnîşankirin.

Niha hewildanên rayedarên hikûmeta herêma kurdistanê di berdewamin da ku birêz mîrê êzidiyan razî bikin ku vê daxwaza xwe ya penaberiye paş de vegeîne, ji ber ku ev pêngava wî dê serokayetiya herêmê têxe nava qeyraneke navxweyî.

Li gorî birêz mîrê êzidiyan dibêje, hejmara êzidiyan li Îraqê ji 700 000 hawilatîyan zêdetire, ji bilî yek endamperleman di perlemana herêmê de ti nûnerên wan nedikabîneya nû ya hikûmeta herêmê û nedihikûmeta navendî ya Bexdayê de ninin, eve ji bê edaletî ye.

Mîr Tehsî beg li sala 1969an bi hewla wergerandina rejîma Bas bi darvekirinê hat ceza kirin, ev yek ew mecbûr kir ku 11 salan li Birtîtaniya weke penaber bijî, li destpêka salên 1980 di şerê qadisiya Sedam de rejîma Îraqê ji boy ku êzidiyan bi hêla xwe ve bikêşe û bişîne eskeriyê efû jêre derxist û mîr Tehsîn vegeriya Îraqê.

Sala 1992an rejîma Îraqê bi siwîqasekê xwest wî ji nav bibin, di wê siwîqasê de bira û jinbira wî canê xwe ji dest den û ew bi giranî birîndar bû. Di bin fişara berxwedana êzidiyan de rejîma Îraqê mecbûr ma gav paş de avêtin.

Sala 2003an de bo cara duyem hewla kujtina wî hat kirin û li sala 2007an de tundrewên Îslamîst, li ber çavê xelkê Kurdistanê koçka wî bi çendîn peristgehên êzidiyan ve li bajarê Êsifnê şewitandin.

Zêdey 70 salaye Mîr Tehsîn beg li ser kursiya mîrgeha şêxane, dostekî dêrîn yê pêşrewê kurd Mistefa Barzanî bû û yek ji dostên herî nêzik yê Mam Celal û Kak Mesûd e.